Kurdiyat

Yıl/Sal/Year: 2022
Sayı/Hejmar/Issue: 6
*e-ISSN 2717-8315*
*Doi: 10.55118/kurdiyat.1196440*
*Rûpel/Sayfa Page: 37 - 48*

# NÊRÎNA WEHDETA WICÛDÊ YA FEXRUDDÎNÊ IRAQÎ*

Şeyhmus ORKİN

Cureya Nivîsarê/Makale Türü/Article Types: Nivîsara Lêkolînê/Araştırma Makalesi/Research Article
Dema Hatinê/Makale Geliş Tarihi/Received: 29.09.2022
Dema Pejirandinê/Kabul Tarihi/Accepted/: 08.12.2022
Şeyhmus Orkin Dr. Öğr. Üyesi, Muş Alparslan Üniversitesi Fen Edebiyat Fakültesi Kürt Dili ve Edebiyatı Bölümü
s.orkin@alparslan.edu.tr
Orcid: 0000-0001-6505-5684

Atıf: Orkin. Ş. (2022). "Nêrîna Wehdeta Wicûdê ya Fexruddînê Iraqî", Kurdiyat, 6, 37 - 48.
Citation: Orkin. Ş. (2022). "Fexruddînê Iraqî's Perspective on the Unity of the Existence", Kurdiyat, 6, 37 - 48.

**Kurte**

Fexruddînê Iraqî ku feqîyê Sedreddînê Qonewî ye di mijara fikra wehdeta wicûdê de yek ji şairên herî muhim e. Lewra raste rast ji çavkanîya eslî yanê ji ser mekteba Îbn Erebî û bi mamostetîya Qonewî ve mijara wehdeta wicûdê fêr bûye. Di berhemên wî de mînak û delîl ji bo fikra wehdeta wicûdê bê jimar in û wî bi terza xwe ve bi helwesteke aşiqane fikra wehdetê û terza helbestên lîrîk kirîye yek. Wehdeta wicûd ku piştî Îbn Erebî wekî fikreke sîstematîk gelek xwenda û zanayên misilmanan di binê tesîra xwe de hişt, bi taybetî di qada edebîyatê de li ser gelek şairan tesîreke mezin çêkir. Bi rêya helbestên Farsî yên Iraqî ve tesîra fikra wehdetê bi taybetî di edebîyata klasîk a Farsî de zêdetir belav bû û ji bo ku berhemên wî di nav terîqetên Tirkan de jî dihat xwendin ev fikr bi rêya berhemên edebî di nav hin terîqetên Anadolê de jî qewîtir bû. Dema ku meriv bixwaze nîşaneyên vê fikrê di helbestên berê de bibîne û ji ser zimanê şairekî ve fêm bike Fexruddînê Iraqî nimûneya ewilîn e ku hem ji serê çavkanîyê ve mijarê îdrak kirîye û hem jî bi rêya berhemên wî ve ev fikr di nav şairên Faris de belav bûye. Tê zanîn ku berhema wî ya bi navê *Leme'etê* ku yek ji klasîkên fikra wehdeta wicûdê tê qebûlkirin zêdetir navdar bûye, lê meriv dikare bibêje ku di piranîya helbestên wî de fikra wehdeta wicûdê hakim e. Ji ser berhemên şairekî mezin û navdar ve hewldana fêmkirina fikra wehdeta wicûdê ji bo fêmkirina wehdeta wicûda di berhemên klasîk ên Tirkî û Kurdî de jî dê alîkarîyê bike. Terîf û mînakên Fexruddînê Iraqî yên li ser fêmkirina wehdeta wicûdê ku mijara vê xebatê ne, ji bo îdraka fikra wehdeta wicûdê derfet in. Lewra ev mijar di nav derbasbûna zemanî de bi xebatên cur bi cur ve zelaltir nebûye belkî zêdetir vegerîyaye girêyekê.

**Peyvên Sereke:** Fexruddînê Iraqî, Wehdeta Wicûd, Edebîyata Klasîk.

* Ev xebat ji serenavek teza min a bi navê "Faḫruddîn-i 'Irâḳî Dîvânı'nın Tahlili" ku li Zanîngeha Ankara û Kirikkaleyê di Makezanista Ziman û Edebîyata Farsî de û di tarîxa 10.11.2021an de hatîye qebûlkirin hatîye çêkirin.

## Faẖruddîn-i ʻİrâḳî'nin Vahdet-i Vücut Görüşü

**Öz**

Ṣadreddîn-i Ḳonevî'nin talebesi olan Faẖruddîn-i ʻİrâḳî, vahdet-i vücud konusunu ele alan en önemli şairlerden biri sayılmaktadır. Çünkü o, doğrudan bu görüşün asıl kaynağı olan İbn-i ʻArabî mektebinden ve bu mektebin en önemli temsilcilerinden olan Ḳonevî'den vahdet-i vücudu öğrenmiştir. Onun şiirlerinde vahdet-i vücud görüşüne işaret eden çokça beyit bulunmaktadır. ʻİrâḳî, bu görüşü lirik şiir tarzıyla ifade eden önemli şairlerden biridir. Özellikle İbn-i ʻArabî'den sonra sistematik bir biçimde ifade edilen vahdet-i vücud görüşü, edebiyat alanında birçok şairi etkisi altına almıştır. ʻİrâḳî'nin Farsça şiirleri ile vahdet görüşünün etkisi, klasik Fars edebiyatında daha çok yayılmıştır. Onun eserleri Anadolu coğrafyasında da okunduğu için ʻİrâḳî, vahdet-i vücudun Anadoluda bulunan tarikatlar arasında da yaygınlık kazanmasında etkili olmuştur. Faẖruddîn-i ʻİrâḳî, vahdet-i vücud görüşünün klasik şiirde nasıl ifade edildiğini gösteren en önemli örneklerden biridir. Çünkü o, bu görüşü ilk kaynaklarından öğrenme imkânı bulmuş ve bunu Farsça şiirler ile ifade etmiştir. Onun *Lemâʻât* adlı eseri vahdet-i vücud görüşünü ele alan meşhur klasik eserlerden biri sayılmaktadır. ʻİrâḳî her ne kadar bu eseri ile ön plana çıkmış olsa da aslında o, Dîvân'ında ve diğer eserlerinde de vahdet-i vücut görüşüne sıkça işaret etmiştir. ʻİrâḳî gibi bir şairin eserlerinde ifade ettiği bu görüşü anlama çabası, Türkçe ve Kürtçe yazılmış klasik eserlerdeki vahdet görüşünü anlamaya da yardımcı olacaktır. Faẖruddîn-i ʻİrâḳî'nin vahdet tarifi ve bu konunun anlaşılması için ele aldığı örnekler bu çalışmanın ana konusunu oluşturmaktadır. ʻİrâḳî'nin vahdet-i vücud tarifi konuyu anlama çabasında olanlar için değerli bir fırsat sayılabilir. Çünkü vahdet-i vücut konusu, üzerinden geçen zamana rağmen anlaşılmaz yönlerini muhafaza eden konulardan biridir.

**Anahtar Kelimler:** Faẖruddîn-i ʻIraḳî, Vahdet-i Vücud, Klasik Edebiya

## Fexruddînê Iraqî's Perspective on the Unity of the Existence

**Abstract**

Fexruddînê Iraqî who is a disciple of Sedreddînê Qonewî is the most important poet in the field of the unity of the existence (pantheism) for he has directly acquired this topic from the original sources, namely from the school of Îbn Erebî and his own teacher Qonewî. There are countless ideas and clues proving his belief in pantheism in his works and he has combined the idea of pantheism and lyrical poetry in a unique way through his own approach of love. Pantheism which has had a great influence on the Muslim scholars as a systematical movement after Îbn Erebî is obviously very influential in the field of literature, especially over poets. Undoubtedly the poets of the classical era are no exceptions as well. When one looks for clues and marks to prove this claim in the poems of the former poets and tries to understand it through the style of a certain poet it is Fexruddînê Iraqî that appears as a first example as he has grasped the topic from its own source and by the help of whis works this idea has become widespread among Persian poets. Although his work named Lemeʻet is more prominent to demonstrate the idea of pantheism the majority of his poems cover the concept of pantheism, too. It would be useful to analyze the works of a great and well-known poet and to endeavour to comprehend the idea of pantheism so as to understand the mentioned concept in the classical works of Kurdish. In other words the topic of this article, namely the description of and examples from Fexruddînê Iraqî that are related to pantheism may be considered as an opportunity to comprehend pantheism. Unfortunately this topic has not gained clearness through various studies and it has consequently turned into a puzzle over the passage of time.

**Keywords:** Fexruddînê Iraqî, The unity of the existence, The classical literature.

**Destpêk**

Fexruddînê Iraqî şairekî navdar ê edebîyata berê ya Farsî ye. Navê wî Îbrahîm bîn Bozorgmihr el-Iraqî ye ku zêdetir bi navê Fexruddînê Iraqî navdar bûye. Li gundê Kumcana Hemedanê di sala 610/1213an de ji dayîk bûye û ehlê malbateke dîndar bûye (Bilgin, 1995: 84-85). Di dema Selçûqîyan de ji bo herêma navbera Isfehan, Hemedan û Tehranê digotin 'Iraqê 'Ecem û ji herêma Iraqa ku niha dewleta Iraqê li ser ava ye digotin 'Iraqê 'Ereb. Fexruddînê Iraqî ji herêma Hemedanê ji Iraqê 'Ecem e. Tê zanîn ku ew sê bira bûne ku birayek wî Qazî Hemîdûddîn Ehmed e û navê birayê wî yê din jî Şemsuddîn e. Malbata wî, hê ku ew pênc salî ye wî dişînin medreseyê û piştî neh mehan Iraqî dibe hafizê Qur'anê. Fexruddînê Iraqî di 17 salîya xwe de hemû ilmên eqlî û neqlî yên medreseyê diqedîne û li bajarê Hemedanê di medreseya Şehristanê de dibe muderris (Şefa, 1991: 1711). Di dema muderrisîya wî de komek ciwanên qelenderî têne medreseyê û helbestan bi semayê dixwînin. Iraqî ku gelek di tesîra van qelenderîyan de dimîne dev ji muderristîyê berdide û dikeve pey wan.

Çend salan li welatên Ereban sefer dike û paşê derbazî Hindistanê dibe. Li wê derê dibe mirîdê Şêx Bahauddîn Zekerîyyayê Multanî û di binê terbîyeya wî ya menewî de seyr û silûka xwe ya tesewwufî diqedîne û bi keça şêx re jî dizewice, dibe zavayê şêx. Ji vê zewacê zarokek bi navê Kebîruddîn çêdibe ku bi tenê yek zarokek Iraqî heye, ew jî Kebîruddîn e. Piştî wefata Şêx Bahauddîn Zekerîyyayê Multanî, Fexruddînê Iraqî dibe xelîfeyê wî û dibe şêxê suhrewerdîyan ê wê herêmê (Xwandmîr,1528). Lê ji ber ku kurê şêxê wefat kirîye ji Iraqî hesûdî dike, hin murîdan dicivîne û li hemberê Iraqî kemînan çêdikin. Iraqî li ber van kemînan mecbûr dimîne ku kurê xwe li wir bihêle û sefer bike. Fexruddînê Iraqî li gelek cihan sefer kirîye. Di pêşgotina *Dîwana* wî de tê gotin ku bi taybetî li Anadolê hema hema li hemû bajaran gerîyaye. Iraqî demeke dirêj li Qonya û Toqatê jîyaye û li van deran di dema Dewleta Selçûqîyan de bi Mewlana Celaleddînê Rûmî û Sedreddînê Qonewî re hevaltîyeke wî ya nêzîk hebûye (Browne, 1977:500). Iraqî demeke dirêj beşdarî dersên Sedreddînê Qonewî bûye ku ev ders ji kitêba navdar *Fususu'l-Hikema* Îbnî Erebî hatîye dayîn. Wî berhema xwe ya navdar a bi navê *Leme'etê* jî di van deman de li Qonyayê nivîsîye.

Bi tevahî çar berhemên wî û hin nameyên wî hene ku li Îranê ji alîyê hin vekolîneran ve ev berhem bi awayekî musteqil hatine weşandin, hin vekolîneran jî hemû berhemên wî di kitêbek de wekî Kullîyata Iraqî weşandine. Berhema wî ya herî mezin *Dîwana* wî ye, lê ev *Dîwan* ji ber ku *Leme'eta* wî pir navdar bûye wekî *Leme'etê* nayê nas kirin. Wî ji bilî *Leme'etê*, *'Uşşaqname* û ferhengokek biçûk bi navê *Iṣṭilaḥatê Ṣûfîyye* jî nivîsîye. Fexruddînê Iraqî ji bo ku li ber destê Sedreddînê Qonewî gelek ders hildaye û beşdarê gelek sohbetên wî bûye her wiha di mijara wehdeta wicûdê de jî gelek kûr bûye. Ew bi vê pozîsyona xwe ya taybet di mijara wehdeta wicûdê de di nav şairên Faris de bûye xwedî cihekî cuda. Lewra fikra wehdeta wicûdê bi helbest û kitêban di nav şairan de belav bûye, lêbelê Fexruddînê Iraqî di dema ku ev fikr herî zêde popûler bûye, di mekteba çavkanîya vê fikrê de yanê di mekteba Îbnî Erebî de ji Sedreddînê Qonewî vê fikrê fêr bûye. Lazim e ku ehemîyeta Sedreddînê Qonewî jî were destnîşan kirin. Lewra ew di vê mijarê de piştî Îbnî Erebî şexsê duyem tê qebûlkirin. Li gorî hin nêrînan Qonewî jî herî kêm wekî Erebî di îzahkirina vê fikrê de xwedî tesîr bûye. Iraqî piştî Anadolê demek çûye Misrê û di dawîyê de jî li Şamê di 8ê Zilqadeya sala 688/1289an de di 78 salîya xwe de wefat kirîye. Tê gotin ku gora wî li pişta gora Îbnî Erebî ye, lê belê ji gora wî tu nîşaneyek heta roja me nemaye (Çîme, 1994:52).

Di vê vekolînê de ji xebata Nesrîn Muxteşem Xuza‘î hatîye îstifade kirin ku xebata wî di terza kullîyatê de hatîye amadekirin. Her wiha hemû berhemên Fexruddînê Iraqî di vê kullîyatê de mewcûd in. Di xebata Xuza‘î de *Dîwana Iraqî* bi terza mesnewîyê ji beyta ewil hate dawîya *Dîwanê* hatîye nimarekirin. Yanê ji bo her xezel yan qesîdeyek nimareyeke din nehatîye dayîn tev wekî berhemek ji serî heta dawîyê bi yek pergal hatîye nimarekirin. Her wiha ji bo her beytek ku hatîye dayîn jimara beytê hatîye dayîn û beyt eger ku ji qesîde, tercî‘ yan jî xezelan be ji bo ku cureya wê bê nîşandayîn ji kurtkirinên wekî “Q”, “T” yan jî “X” hatîye îstifadekirin. Ji bo *Leme‘et* yan jî *‘Uşşaqnameyê* bi tenê nimareya rûpelê ya heman kullîyatê hatîye dayîn.

**Li Gorî Fexruddînê Iraqî Fikra Wehdeta Wicûdê**

Têgeha “wehdetê” ku fikra wehdeta wicûdê pêk tîne tê meneya “yekîtîyê” û ev têgeh carinan wekî “ehedîyetu’l-wicûd” jî tê bikaranîn. Ev fikr her çi qas cara ewil bi awayekî sîstematîk ji alîyê Îbnî Erebî ve hatibe îfadekirin jî navê vê fikrê yanê navê “wehdeta wicûdê” ji alîyê Îbnî Erebî ve nehatîye bikaranîn. Navê vê têgehê ji alîyê peyrevên Îbnî Erebî ve ji bo îzahkirina fikrên wî hatîye bikaranîn. Bi vê fikrê tê armanckirin ku bawerîya Xwedayek deîst ku di dereceyek bilind de tê tenzîhkirin bê redkirin. Digel vê bawerîyek Xweda ku çawa di Qur’anê de jî tê gotin di navbera tenzîh û teşbîhê de ye bê sazkirin. Merheleya ewil a vê armancê jî îfadekirina eynîyeta navbera Xweda û hebûnê ye (Demirli, 2012: 431-433).

Fexruddînê Iraqî demeke dirêj feqîtîya Sedreddînê Qonewî kirîye ku ew wek muhîmtirîn nûnerê mekteba Îbnî Erebî tê hesibandin. Her wiha Iraqî ji fikr û nêrînên Îbn Erebî bi awayekî ciddî tesîr wergirtîye. Nêrîna wehdeta wicûdê ku bi wesîleya beytên şahid ên ji berhemên Fexrudînê Iraqî dê were îzahkirin bi awayekî xulase tê wê meneyê ku Xweda di ulûhîyet û rubûbîyetê de çawa yek tê qebûlkirin lazim e ku di mijara hebûnê de jî yek bê qebûlkirin. Li gorî wehdeta wicûdê “hebûn”, di meneya heqîqî de çavkanîya hebûna xwe bi xwe ye û ji bo hebûnê hewcehîya çavkanîya hebûnê bi tiştekî din tune ye. Yanê ew ji bo hebûna xwe girêdayê tiştekî din nîne. Di vê çarçoveyê de Xweda ku di hebûna xwe de girêdayê tiştekî din nîne, lê ew e çavkanîya hebûna hemû mewcûdatên ku em dizanin. Her wiha ji xeyrê Xweda qebûlkirina hebûnek heqîqî di fikra wehdeta wicûdê de ne mumkun e. Berhema *Leme‘et*ê di nav berhemên Fexruddînê Iraqî de ew berhem e ku tê de herî zêde behsa fikra wehdeta wicûdê hatîye kirin. Iraqî di vê berhemê de ji ser minakên şênber ve xwastîye ku xwendevan mijara wehdetê fêm bikin. Mesela mijara wehdet û kesretê yek ji wan mijaran e ku ji bo fêmkirina wehdeta wicûdê alîkarî dike. Fexruddînê Iraqî di derbarê vê de tîne ziman ku digel zêdebûna dilopan behr zêde nabe, li holê çi qas dilopên zêde hebin jî behr bi tenê yek e (۱۳۷۲hş.: 462). Iraqî di lem‘eya yanzdehan de jî behsa ferqa navbera wehdet, îttihad û hulûlê dike û tîne ziman ku wehdeta wicûd, hulûl yan jî ittîhad nîne. Îttihad yek bûyîna tiştekî bi tiştekî din ve ye, hulûl jî daxilbûna tiştekî bi tiştekî din re ye. Lê di wehdeta wicûdê de du tişt tune ye ji ber vê wehdet, ji hulûl û îttihadê cuda ye. Iraqî vê mijarê ji ser mînakek şênber ve bi awayekî balkêş anîye ziman. Wî ji bo vê meseleyê eyneyê mînak daye ku dema dîmen li ser rûyê eyneyê dixuyê, ew dîmen hem bi eyneyê re nabe yek hem jî nakeve hundirê eyneye (1372hş.:485). Mijara wehdeta wicûdê ku heta îro gelek tişt li ser hatine gotin, bi xebatên ku bi armanca îzahkirina wê hatine kirin ve di warê fêmkirinê de zêdetir asê bûye. Ji bo îzahkirina mijareke wiha îstifadekirina ji gelek mînakên şênber, di vî warî de şohreta Fexruddînê Iraqî gelek zêde kirîye. Lewra fêmkirina mijara wehdeta wicûdê bi “tecrubeya hal” re têkildar e û meriv eger ku xwedîyê tecrubeyeke wiha nebe yan jî di tecrubeya hal de di dereceya fêmkirina wehdetê de nebe jî, ji ser beyana Iraqî ve meriv dikare di derbarê wehdetê de bibe xwedî fikreke giştî.

Di gelek minakên helbestên Edebîyata Klasîk de heta di gelek beytên Iraqî bi xwe de wehdeta wicûd yan jî wusleta aşiqan bi Heq re, zahiren dişibe îttihadê. Bi zimanê helbestê îzahkirina meseleyê yan jî alîyên mecazî yên zimanê helbestê dibe sedema vê. Yan jî gotinên bi meneya "Ene'l-Heq" ya gelek şairên navdar di destpêkê de wekî hulûlê dixuyê, lê di van mijaran de îzahên Fexruddînê Iraqî meriv ji xeletfêmkirinên wiha diparêze. Mesela mînaka eyneyê di vir de nîşan dide ku eksa Heq ya li ser eyneyê ne bi eyneyê re bûye yek ne jî têketîye hundirê eyneyê. Ev îzah hem hulûlê hem jî îttihadê red dike. Her wiha ne mumkun e ku meriv ji ber vê eksê ji eyneyê re bibêje ew Heq e yan jî Heq têketîye nava wê. Dema ku meriv ji bo îzaha vê mijarê ji mecazên durust îstifade neke wê çaxê mijar asêtir dibe û heta xelet tê fêmkirin. Mesela ji mînakên gelek şairan tê fêmkirin ku yê ku eksa wê ketîye ser eyneyê jî eyne bi xwe jî heman tişt e. Fexruddînê Iraqî mijarê bi helwesteke tenzîhker lê bi teşbîheke pispor bi meriv dide fêmkirin.

در همه هستی حقیقت نیست هستی غیر او هر چه هست از هستی اوست قلیل و از کثیر (Q 73)

*Di heqîqetê de di nav hemû hebûnan de ji xeyrê hebûna wî hebûneke din tune ye.*

*Kêm be yan jî zêde be hemû hebûn ji hebûna wî ne.*

Li gorî Fexruddînê Iraqî di nav hemû hebûnên ku têne dîtin û yên ku nayêne dîtin de ji xeyrê Xweda hebûneke rastî û heqîqî tune ye. Tu hebûneke ku di çavê me de wekî hebûn dixuyê û em zen dikin ku hebûn e bi serê xwe xwedî hebûneke serbixwe nîne. Ji xeyrê Xweda tu hebûnek çavkanîya hebûna xwe nîne. Û her çi tiştekî ku em wekî "hebûn" dizanin ancax girêdayê hebûna Xweda ne û bi hebûna wî dikarin hebin.

غیر او چون خود نباشد کی توان بودش شریک؟ چون همه او باشد آخر کی توان بودش نظیر؟ (Q 74)

*Ji bo ku ji xeyrê wî tune ye kî dikare bibe şirîkê wî?*

*Ji bo ku tev ew e, kî dikare bibe şibhê wî?*

هر که او دعوی هستی می‌کند آشکارا بت‌پرستی می‌کند (X 724)

*Her çi kesekî ku doza hebûnê bike,*

*Ew bi awayekî eşkere putperestîyê dike.*

Mutesewwifên xwedî fikra wehdeta wicûdê mijara şirkê bi nêrîneke balkêş dinirxînin. Li gorî nêrîna wan ji xeyrê Xweda meriv ji bo hebûnek din nikare di meneya heqîqî de îddia hebûnê bike. Li gorî bawerîya Îslamê evdîtî ji xeyrê Xweda re şirk e û Xweda gunehên ji bilî şirkê efû dike, lêbelê guneha şirkê efû nake. Di derbarê wê mijarê de di sûreta Nîsayê ayeta ٤٨an de wiha tê gotin: *"Xweda, ji bo wî şirîk çêkirinê teqez nabexşîne. Ji xeyrê vê ew kê bixwaze dibexşîne. Kesên ku ji Xweda re şirîk çêkirine gunehekî mezin kirine û îftira kirine."* Belê şirk mezintirîn guneh e û zilm e ku kesên li ser şirkê bimirin ji mexfîreta Xweda jî mehrûm dimînin. Meneya mexfîretê ew e ku Xweda bi rehma xwe gunehan dipêçe. Lê li gorî bawerîya wehdeta wicûdê ji bo ku ji bilî Xweda hebûnek tune ye kesên ku ji xeyrê Xweda hebûnek qebûl bikin ew muşrîk in lewra ew tiştekî ku di heqîqetê de tune ye ji Xweda re dikin şirîk ku bi vî awayî tiştekî ji alîyê Xweda ve bi rehmetê bi pêçandin namîne. Ji bo ku tiştek were efûkirin lazim e ku ew hebe. Lê kesên ku ji Xweda re şirîk çêdikin ji ber ku Xweda bê şirîk e û hebûna şirîkekî ji bo Xweda tune ye her wiha guneha şirkê jî ji ber vê alîyê xwe yê nebûnê nayê efûkirin (Konevî, 2014: 198). Ji bo ku ev me-

sele çêtir bê fêm kirin meriv dikare wiha jî îzah bike, mesela zina yan jî vexwarina şerabên ku serxoş dikin heram in û ev heram di heqîqetê de meneyeke wan zahireke wan yan jî heqîqeteke wan heye. Mesela meriv şerabê vedixwe û ji ber kirina vî karî gunehek çêdibe ku li holê karek û pêkhatinek heye bikeve ser terazîyê. Lê li gorî fikra ehlê wehdetê di şirkê de tiştekî wiha tune. Mesela hûn kevirekî, dareki yan tiştekî ji Xweda re bikine şirîk, ev kar ji ber ku pêk nayê, heqîqeta wê tune ye, ne zahirî ne batinî îmkana wê jî tune ye ku ji ber vê tunebûnê tiştek di muqabilê vê de nakeve ser terazîyek û her wiha efûya gunehê şirkê dibe ne mumkun. Iraqî jî, ji bo ku balê bikêşe ser vê, vê pirsê ji xwendevanan dipirse: “Ji bo ku kesek ji xeyrê wî tune ye kî dikare bibe şirîkê wî” ji ser vê pirsê ve Iraqî beyan dike ku gunehê şirkê di heqîqetê de ne mumkun e ku pêk were û kesên ku vî gunehî dikin ji bo tiştekî ku di eslê xwe de tune ye dikevin nav xusranê. Di beyta din de Iraqî dîyar dike ku kesên doza hebûnê dikin yanê îddia dikin ku ew hene, bi awayekî eşkere ew putperestîyê dikin. Lewra doza hebûnê bi tenê doza Heq e û meriv dikere ji bo Heq behsa hebûnê bike. Ji bo mexlûqatê meriv nikare behsa hebûneke heqîqî wekî hebûna Xweda bike.

تا چو مستغرق شوم در بحرژرف بیخودی　　　سر بسر دریا شود، نی جوی ماند نه غدیر(Q 65)

*Dema ku di behra heyretê de xerq bûm,*

*Ji serî heta binî tev dibe behr, ne çem dimîne ne jî pengav.*

تا چو با بحر آشنا گردم برون آرم دری　　　کز فروغ عکس آن گردد دو عالم مستنیر (Q 66)

*Dema ku ez bi deryayê re aşina bûm ez jê durreyek derdixim,*

*Ku bi ronahîya ‘eksa wê her du alem ji nûrê ronî dibin.*



Di beytên jorê de Fexruddînê Iraqî ji bo meqamê heyretê îfade bike ji mefhûma behrê îstifade kirîye. Di beyta duyem de jî ji bo derbazbûna ji meqamê heyretê ber bi meqamê wehdetê ji peyvan “durrê” îstifade kirîye. Li gorî meneya berfireh a her du beytan salikê ku di meqamê heyretê de ji alîyê behra heyretê ve hatîye dorpêçkirin û li her tiştî bi nezera heyretê dinêre piştê ku bi vê deryayê re aşina bûye êdî ji vê merheleyê derbasê merheleya wehdetê bûye ku ew jî bi durrê hatîye îşaretkirin. Di beyta duyem de ji bo durreyê yanê meqamê wehdetê tê gotin ku bi wê, raza her du aleman ji bo salik vedibe.

Li gorî fikra Îbnî Erebî û hin zanayên Misilman, tewhîd nûr e, şirk jî tarîtî ye. Yek nûrek heye ku ew dikare meriv ji tarîtîya ku dawîya wê helak e xelas bike ew jî redkirina îlahên sexte yên ji xeyrê Xweda ne. Fexruddînê Iraqî ji her cure tarîtîya şirkê xwe dispêre Xweda û jê ronahîya tewhîdê dixwaze. Beyta jêrê ya Iraqî, fikra Îbnî Erebî ya “hebûn nûr e tunebûn jî tarîtî ye” (Arabî, 2016, r. 106), îzah dike.

وز شعاع نور توحیدت، تو توحید مرا　　　روشنایی ده که ماندم در گو ظلمت اسیر (Q 102)

*Ji ronahîya nûra tewhîdê, tewhîd bide me.*

*Ronahî bide me. Ez di nav lepê tarîtîyê de hêsîr mame!*

Di beyana yekîtîya Xweda de hijmar û quderata kelîmeyan kêm e. Heqîqeta yekbûna wî ji kelîme û îzahan zêdetir bi rêya tetbîqî ji ser emelan ve tê tecrube kirin. Lewra di hişê însanî de “pirrbûn” heye ku yekîtîya Xweda vê pirrbûnê dorpêç kirîye û dîtina yekîtîya ku ser vê pirbûnê dorpêç kirîye zehmet e. Çawa ku dîtina vê zehmet e bi kelîmeyan îzahkirina vê jî ne hêsan e.

توحيد ذوالجلال نيايد چو در مقال　　　روشن کنم ضمير، به تسبيح لايزال (T 155)

*Tewhîda Zulcelal bi gotinan nayê îfadekirin.*

*Bi tesbîha Layezal qelbê ronî bikim.*

چندان که همه گواه گشتند　　　بر هستی وحدتش به يکبار

ديدند عيان که اوست موجود　　　ويشان همگی خيال و پندار (T 3420-21)

*Di carek de hemû bûn şahidê yekbûna hebûna (wehdeta wicûda) wî.*

*Bi awayekî zelal dîtin ku yê heye ew e. Yên din tev xiyal û zindan in.*

Arif piştî ku qebûl dike Xweda, bi yekîtîya xwe ve xwedîyê hebûna heqîqî ye paşê muşahede dike ku di nav hemû cîhanê de ji xeyrê wî tiştekî din tune ye ku bi rastî bikare hebe û ji vê re bi yeqîn îman dike. Her wiha Iraqî behsa nûra wehdetê jî dike ku ev nûr eger ku ‘eyan be, hemû cîhan ji ber qudreta wê bela wela dibe.

به حقيقت يقين کنند که نيست　　　جز يکی در همه جهان ديار

نور وحدت چو آشکار شود　　　متواری شود جهان ناچار(Q 182-183)

*Bila yeqîn bi heqîqetê îman bînin. Di tevahîya cîhanê de ji yekî pêştir tune ye.*

*Dema ku nûra wehdetê eşkere bû hemû cîhan bi awayekî bêçar bela wela dibe.*

Di seyr û silûka eşqê de dema ku meriv ji hemû enanîyeta xwe dibore û di rêya gihîştina Heq de meriv hemû hewa û hewesa xwe terbîye dike di encama tebîî ya vê rêyê de exlaqê meriv dişibe exlaqê Xweda. Dema ku exlaqê meriv bişibe exlaqê Xweda, wê çaxê ew halê ku Xweda dibe çavê meriv ê ku dibîne, guhê meriv ê ku dibihîze, destê meriv ê ku digire pêk tê. Li gorî agahîyên ku Iraqî di *Leme'et*a xwe de dide salikên ku di rêya wehdetê de derdikevin seferê, ew salik, bi cazîbeya ji alîyê Heq ve dibin eyneyên Heq û her wiha Heq jî dibe eyneya wan (1372hş., r. 471).



درين ره گر بترک خود بگويی　　　يقين گردد تو را کو تو، تو اويی (X 711)

*Dema ku te di vê rê de xwe terikand,*

*Yeqîn tu dibînî ku ew tu, tu jî ew î.*

Fexruddînê Iraqî ku razên wehdetê beyan dike dibêje ku eger min zimanê xwe bigirta ev raz eşkere nedibûn. Ji razên ku eşkere kirîye tê fêmkirin ku di alemê de ji yekî pêştir tune ye. Iraqî alemê wekî malekê teswîr dike û her çi kes û tiştên ku di malê de hebin çavkanîya hebûna wan yek e û ew jî her Heq e. Iraqî di mijara hebûnê de du rê dide ber xwendevanan: yan divê ku hemû mexlûqat bên înkarkirin yan jî hijmara wan her çi qas zêde bixuyê jî lazim e ku tev yek bêne qebûlkirin. Yanê di hijmarê de sed be yan jî hezar be ferq nake di heqîqetê ji yekî zêdetir tune ye.

هر چيز که دانی جز او دان که همه اوست　　　يا هيچ مدان در دو جهان، يا همه او دان (X 1635)

*Her çi tiştekî ku tu dizanî, bizane ku hemû ew e.*

*Yan her du cîhanan qet nezane yan jî bizane ku hemû ew e.*

ور هيچ پس و پيش و چپ و راست ببينی　　　پيش و پس و راست و چپ و بالا همه او دان (X 1636)

*Eger paş, pêş, çep û rastê bibînî,*

*Pêş û paş û rast û çep û jor tevan "ew" bizane.*

کاشکار و نهان همه ماییم          لیس فی‌الدار غیرنا دیار

این سخنگر نشدتو را روشن          جام گیتی‌نمای را به کف آر

تا ببینی درو که جمله یکی است          خواه یکصد شمار و خواه هزار

هر پراکنده‌ای که جمع شود          بر زبانش رود چنین گفتار

گر عراقی زبان فرو بستی          آشکارا نگشتی این اسرار (Q 2650-2654)

*Eşkere û veşartî hemû em in.*

*Di malê de ji me pêştir tune ye.*

*Dema ku te vê gotinê îdrak nekir,*

*Qedeha ku cîhanê nîşan dide bigire destê xwe.*

*Li wê derê tu dê bibînî ku hemû yek e.*

*Te divê wekî sed bijmêre te divê wekî hezar bijmêre.*

*Her tiştekî belav dema ku kom bibe,*

*Gotinek wiha tê ser lêva meriv.*

*Eger ku Iraqî bikarîya zimanê xwe bigirta,*

*Ev raz eşkere nedibûn.*



Fexruddînê Iraqî heta ku karîye mijara wehdeta wicûdê ji ser mînakên şênber ve îzah kirîye. Mesela ew ji bo ku mijarê bide fêmkirin ji mînaka av û berfê îstifade dike. Dema ku av diqerise dibe berf û cemed, lê dema ku dihele cardin vedigere avê. Her wiha berf yan jî cemed ku bi şiklê xwe û navê xwe her çi qas ji avê cuda bin jî di rastîyê de ew tiştek ji xeyrê avê nînin. Ji ser vê ve Ewwel ew e yanê av ew e û Axir dîsa ew e yanê berf ew e. Pelên berfê her çi qas bi milyonan bin jî di rastîyê de tev ji yek avek in. Iraqî mînakek din jî ji ser avê ve dide ku dema herî têkeve nav avê, reng û bêhna avê diguhere û heta navê wê jî diguhere dibe ava bi herî. Lê belê ev guherîn heqîqeta avê naguherîne ku her çi qas bêhn û reng û navê wê biguhere jî ew dîsa av e. Iraqî tîne ziman ku ev raza wehdetê ji alîyê eşqê ve bi awayekî eşkere tê beyan kirin. Yanê ev meseleya ku bi mînakan ve hatîye îzah kirin di merheleya emelî de herî baş bi eşqê tê îdrak kirin. Eşq ew hêz û qudret e ku bi tecrubeyeke kûr û bi yeqîneke hêzdar vê meseleyê bi meriv dide fêm kirin.

اول و آخر اوست در همه حال          ظاهر و باطن اوست در همه باب

گر صد است، ار هزار، جمله یکی است          در نیاید به جز یکی به حساب

برف خوانند آب را، چو ببست          باز چون حل شود چه گویند آب؟

آب چون رنگ و بوی گل گیرد          لاجرم نام او کنند گلاب

بر زبان فصیح هر ذره          می‌کند عشق لحظه لحظه خطاب

که همه اوست هر چه هست یقین          جان و جانان و دلبر و دل و دین (T 2722-2727)

*Ewwel û Axir ew e di her halî de,*

*Zahir û Batin ew e li her derê.*

*Sed jî be hezar jî be hemû yek e.*

*Ji yekî zêdetir nayê hesibandin.*

*Dema ku av diqerise jê re dibêjin berf*

*Dîsa dema ku dihele çi dibêjin jê re? Av.*

*Dema ku av reng û bêhna herîyê girt,*

*Mecbûren jê re dibêjin ava bi herî.*

*Eşq her dem bi zimanekî fesîh xîtabê her zerreyek dike.*

*Yeqîn hemû ew e, her çi hebe,*

*Can jî canan jî dilber jî dil jî dîn jî.*

ظاهر و باطن تویی و طالب و مطلوب تو و آن دگر نامی است اندر هر زبان انداخته (Q 3787)

*Zahir û Batin tu yî, Talib û Metlûb tu yî.*

*Yên din bi tenê nav in ku di zimanê de hatine dayîn.*

Kesret û wehdet du têgeh in ku ziddê hev in, lê ji kesretê meqset îdraka wehdetê ye. Heq ji bo ku wehdeta wî çêtir bê fêmkirin mexlûqatê di nav kesretê de xuliqandîye. Ên arif dema ku meseleyê fêm kirin êdî kesret bala wan nakêşe ku ew piştî îdraka vê berê xwe didin meqseda kesretê yanê berê xwe didin wehdetê. Kesret di rastîyê de wehdet e yan jî nîşaneya wehdetê ye lewra mexlûqat digel nav û şiklên cuda ji hebûnê nayên hesibandin (Konevî, 2014: 96-97).



کثرت نفسی برای آن بود تا وحدت از آن شود پدیدار

چون ظاهر شد که جز یکی نیست چه فایده از ظهور بسیار؟

گر در نظر تو کثرت آید وحدت بود آن، ولی به اطوار (T 3425-3427)

*Kesreta nefsê ji ber vê ye,*

*Ku pê wehdet bê dîtin.*

*Dema ku zahir bû ji yekî pêştir tune ye*

*Wê çaxê di zuhûra zêdetir de çi fayde heye?*

*Dema ku çavên te kesretê bibînê,*

*Ew bi rastî wehdet e lê di şiklên cuda de têdîtin.*

Iraqî behsa sûreta mexlûqatê dike û tîne ziman ku ferqa sûretên mexlûqan bûye sedem ku însan di vê mijarê de şaşîtîyê bike. Di rastîyê de her çi qas sûret cuda bin jî di nav dilê her sûretek de nûra ku eks daye ji heman nûra Heq e ku çavkanîya wê nûrê yek e. Di milyonan sûretên cuda de sûreta ku tecellî dike jî bi tenê sûretek e ku ew jî sûreta Heq e. Lê belê tu sûretek xuliqandî ne mumkun e ku sûreta Heq be lewra sûreta wî tecellî dike ema ne mumkun e meriv sûreta wî daxe dereceya sûretên mexlûqan. Iraqî bi vî awayî dîsa rêyek bi teşbîh dide ber xwe lê di heqîqetê de bi awayekî tenzîhker mijarê îzah dike.

جمله یک چیز است موج و گوهر و دریا ولیک صورت هریک خلافی در میان انداخته

در همه صورت تویی و نیست خود صورت تو را وین حقیقت حیرتی در رهروان انداخته

روی خود بنموده هر دم در هزاران آینه در هر آیینه رخت دیگر نشان انداخته (Q 3791-3793)

*Hemû yek in; pêl, gewher, behr û felek. Sûretên van îxtilaf derxiste holê.*

*Di hemû sûretan de tu heyî lê ji bo te sûretek tune ye.*

*Vê heqîqetê heyret daye hemû rûhan.*

*Tu rûyê xwe nîşan didî her dem di hezaran eyneyan de.*

*Rûyê te di her eyneyê de bi awayekî cuda xuyabû.*

Mînaka roj û stêrkan mînakeke din a şênber e ku Iraqî ji bo îdraka fikra wehdeta wicûdê jê îstifade kirîye. Li gorî vê mînakê stêrk ku bi tarîtîya şevê ve dîyar dibin û ji alîyê mirovan ve têne dîtin, lê bi hilatina rojê ve ronahîya rojê wisa dike ku êdî çav nikare stêrkan bibîne. Iraqî îfade dike ku bi zuhûra nûra Heq ve her çi tiştekî ku bi navê nûrê hatîye bi nav kirin tune dibe û hukmê xwe ji dest dide.

چون ز خورشید شد ضیا پیدا چون نگردد ستاره ناپیدا؟ (1372hş., r. 376)

*Piştî derketina nûra rojê stêrk çawa winda nebin?*

Şevnem yan jî xunav ew dilopên avê ne yên ku bi sermaya şevê li ser ruyê tiştên sar çêdibe. Buxarbûna şevnemê ku li ber germa rojê pêk tê û di encama vê de ber bi asîmanê ve bilind dibe dişibe dilopên ku digihîjin behrê. Di her duyan de jî dilop hene û ev dilop li hemberê qudretek wekî tav yan jî behrê dev ji hebûna xwe berdidin û ber bi wê qudretê ve diçin. Ev çûyîn yan jî ev rewş dema ku tê muşahede kirin, salik ji ber vê dikeve halê heyretê. Her wiha ji ser van mînakan .ve tê zanîn ku însan ji bal Heq ve hatîye û wekî wan dilopan cardin dê vegere cem Xweda



آفتاب جذبهٔ تو شبنم اشباح را در زمانی از زمین تا آسمان انداخته (Q 42)

*Tava cezbeya te şevnema (xunava) ber rûyê eşyayan,*

*Di carek de ji erdê heta asîmanê bilind kir.*

تا چو مستغرق شوم در بحرژرف بیخودی سر بسر دریا شود، نی جوی ماند نه غدیر (Q 65)

*Dema ku di behra heyretê de xerq bûm,*

*Ji serî heta binî tev dibe behr, ne çem dimîne ne jî pengav.*

در ساحت قدم نبود کون را اثر در بحر قطره را نتوان یافتن نشان (T 149)

*Di asta qidemê de ji hebûnê eser tune bû.*

*Di nav behrê de nîşaneya dilopê nayê dîtin.*

بر هوا شد بخاری از دریا باز چون جمع گشت دریا شد

نسبت اقتدار و فعل به ما هم از آن روی بود کو ما شد (T 2670,2672)

*Ji behrê ber bi hewayê ve bûxarek çêbû.*

*Kom bû û cardin vegerîya behrê.*

*Di me de fiil û îqtidar tune ye.*

*Ji ber vê "ew" bû "em".*

Di vê şibandina behr û dilopê de Iraqî dîyar dike ku behr şamil e û dilop di nav şamilbûna behrê de êdî nayê ferq kirin ku her wekî tune dibe. Digel vê behr bi qudreta xwe ya dorpêçker ve dilopê digire hundirê xwe û wê dişibîne xwe ku êdî ji dilopê, ji nav û şiklê wê eserek namîne. Her wiha bi vê beşdarîyê dilop êdî dev ji hebûn û taybetîyên xwe berdide, taybetîyên deryayê werdigire. Dîsa Iraqî dîyar dike ku evd çawa ku xwedî hebûnek heqîqî nîne bi heman awayî xwedî îqtidar û fiil jî nîne. Yanê her kar û tevgerek ku dike jî girêdayê îrade û teqdîra Xweda ye ku her çi qas di vî warî de evd îrade nîşan bide jî bêyî destûra Xweda kar û fiil pêk nayên.

**Encam**

Ev hemû agahîyên ku hatine dayîn ji tecrubeyên arifekî navdar in ku wî bi halê xwe bi jîyîn û tecrubeya xwe van agahîyan bi dest xistîye. Gelo meriv çi qas bi tehlîla van metnên mensûr û menzûm dikare vî halî yan vê mijarê fêm bike, teqez nayê zanîn. Lewra arif bi jan û sancîyên mezin ve gihîştine van tecrubeyan. Û hema hema tevahîya arifan di vê de îttifaq kirine ku ev tişt bi "qalê" nayê fêm kirin ancax bi "hal" tê îdrak kirin. Bi taybetî di mijara wehdeta wicûdê de meriv dibîne ku gotinên arifan bi zêdehî dişibin hev û behsa heman tiştî dikin lê ji ser van heman gotinan ve dema meriv bala xwe dide xebatên vekolînên modern, meriv dibîne ku di derbarê wehdeta wicûdê de bi dehan terîf derketine holê. Ev nîşaneyek e ku arif xalek muhim destnîşan kirine ku meriv bê tecrubeya hal nikare bigihîje encameke rast. Lewra ji alîyek ve jî ev qas terîf û agahîyên ku digel hev wekî nakokî dixuyên ji bo xeletfêmkirina meseleyê jî delîl in. Lê digel vê di derbarê mijara wehdeta wicûde de xebatên hatine kirin û yên hê jî berdewam in alîyên cuda yên wehdeta wicûdê jî nîşan didin. Di vir de gotinek Îbnî Erebî ji bo rewşa fêmkirina vê mijara asê belkî fikrek dide meriv ku ew wiha dibêje: "*Tu çi qas bixwazî gotinek îzah bikî, ew qas wê xerab dikî*" (2015: 35).

Di encama vê vekolînê de hatîye tesbît kirin ku mijara wehdeta wicûdê di heman demê de ji bo ku mijara bawerîya hebûnê ye, her wiha ev fikr di derbarê nêrîn û bawerîya fikra hebûna şairan de jî gelek agahî dide. Fexruddînê Iraqî raste rast îşareta hebûnê kirîye û dîyar kirîye ku hebûna heqîqî ya Xweda ye hebûnên din yanê hebûna mexlûqan ne wekî hebûna Xweda ne û ji ber vê di hebûnê de wehdet yanê yekbûnek heye ku ew hebûna yek ancax a Xweda ye. Tebîî ye ku hin fikr tesîr li ser nêrîn û meneya têgehên meriv bike. Fikra wehdeta wicûdê jî li ser hin têgehên ehlê vê fikrê tesîr kirîye ku yek ji van têgehan jî têgeha şirkê ye. Di meneya xwe ya ewilîn de şirk ew kar e ku meriv tiştekî di uluhîyet yan jî alîyên din ên Xweda de jê re bike şirîk. Lê ev têgeh hate dîtin ku di nêrîna Fexruddînê Iraqî de tê wê meneyê ku şirk ew e ku meriv ji xeyrê Xweda sifeta hebûnê bide mexlûqeke din. Û ji alîyek din ve ne mumkunbûna şirkê jî alîyekî din ê balkêş bû ku li gorî Iraqî û mutesewwifên ehlê wehdeta wicûdê wisa dizanin ku meriv her çi tiştî bi her kîjan alîyê ve ji Xweda re bike şirîk jî ev kar û emel di heqîqetê de pêk nayê lewra mumkun nîne ku kesek yan tiştek ji Xweda re bibe şirîk. Digel van Iraqî jî wekî gelek şairên edebîyata klasîk balê kişandîye ser kesret û wehdetê û dîyar kirîye ku di kesretê de wehdet heye. Iraqî eynî wekî hin şairên Klasîk vê xalê destnîşan kirîye ku Xweda bi meqseda nasandina tewhîda xwe kesretê çêkirîye ku li gorî Iraqî kesret nîşaneyeke mezin a wehdetê ye. Bi kurtasî meriv dikare bibêje ku Iraqî di hemû berhemên xwe de vê heqîqetê îfade kirîye ku meriv bi çav çend bibîne ger sed bibîne ger hezar ferq nake hemû di heqîqetê de ji yekî zêdetir nîne.

**Çavkanî**


Arabî, İ. (2016). *Fusûsu'l-hikem.* (E. Demirli, Çev.) İstanbul: Kabalcı Yayıncılık.

Arabî, İ. (2015). *Tasavvuf terimleri sözlüğü.* (E. Demirli, Çev.) İstanbul: Litera Yayıncılık.

Bilgin, Orhan, "Fahreddîn-i Irâki", *DİA*, C. 12, İstanbul, 1995, s. 84-86.

Çîme, M. E. (١٩٩٤). *Meqamê Şêx Fexruddînê 'Iraqî der Teşewwufê Îslamî*. Îslamabad: Merkezê Teḥqîqatê Farsîyê Îran ve Pakistan.

Demirli, Ekrem, "Vahdet-i Vücûd", *DİA*, C. 42, İstanbul, 2012, s. 431-435.

Edward G. Browne, A Literary History of Persia, *From Firdawsi to Sa'di*, Vol. II, Cambridge University Press, Cambridge, 1977.

Enverî, Ḥ. (1393hş.). *Ferhengê rûzê suxen.* Tehran: Întişaratê Suxen.

Iraqî, F. (1372hş.). *Kullîyat (Mecmû'ayê asarê Fexruddînê Iraqî)*, (N. Muxteşem Xuza'î, tsh.) Tehran: Întişaratê Zevvar.

Şefa, Z. (1991). *Tarîxê Edebîyatê Îran.* Tehran.

Konevî, S. (2014). *Esmâ-i Hüsnâ şerhi.* (E. Demirli, Çev.) İstanbul: Kapı Yayınları.

Konevî, S. (2014). *Vahdet-i Vücûd ve Esasları.* (E. Demirli, Çev.) İstanbul: Kapı Yayınları.

Xwandmîr, Ġ. B. Ḥ. Ḥ. (t.t.) *Tarîxê Ḥebîbu's-Sîyer.* Xeyyam.